

EM AŞÎXWAZ IN



PEYVA WELAT

Em aştîxwaz in

Desteya sernivîs

2 *Li ser dirêjahiya dîroka gelê kurd herdem ew lrastî zordestiyê, qirkirinê û çewsînê hatiye, û herdem jî berevanî di ber hebûna xwe de kiriye. Dijminên gelê kurd di şerê xwe yê qirêj de yê li dijî hebûna gelê kurd hemû reng, şewaz û cureyên hovîtiyê bi kar anîne bêtî ku ti nirxên mirovî, sincî an olî ber çav bigirin, aramancî dijminan jî vî şerî tinekirina kurdan e yan bişaftina wan ya netewî ye, anku armançke qirêj û hovane ye.*

Li hemberî wê heger em li dîroka xebat û tekoşîna gelê kurd binêrin em ê bibînin ku xebateke sipî ye û ticarî sinc û nirxên mirovî binpê û derbas nekiriye. Wekî ku rûpela dijminên gelê kurd di vî şerî de reş û tarî ye hewqasî rûpela tekoşîna gelê kurd sipî û pak e.

Ew welatê me dagîr dikin û dixwazin me ji holê rakin û me tine bikin, lê em azadiyê û wekheviyê ji xwe û ji wan re dixwazin û ticarî me çavê xwe bernedaye welatê wan.

Ew jin û zarokên me dikujin û ferq û cudahiye naxin navbera çekdar û sivîlan, gund û bajarên me wêran dikin, mal û milkên me talan dikin, kuştina me helal û rewa dikin, zimanê me qedexe dikin, me mirov nabin, lê herdem destê me ji bo aştîyê û biratiyê dirêjkiriye.

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerfna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Gelo ev çi hişmendîyeke qirêj û nijadperest e di serê dijminên gelê kurd e hatiye çandin ku dihêle tevde nakokiyên xwe ji bîr bikin û li ser qirkirina gelekî bindest bibin yek !? Gelo ev çi nervîneke bêbext e ku em xistine bindestê van hovan !?

Belê kurd miletekî aştîxwaz e, xwedî mafekî rewa û xebateke pak û pîroz e, û heya ku negihêje maf û azadiya xwe, ticarî rojhilata navîn aştî û aramiyê nabîne. Gelo kengî dijminên gelê kurd û cîhan vê rastiyê wê nas bikin !? ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



PERWERDE Û HÎNBÛN...

Adil Ibrahim

Ev çend roj in ku werzê xwendinê dest pê kiriye, ji ber wê jî pêwîst e hinekî li ser xwendinê (perwerdeyê) were rawestandî. Gelo perwerde çi ye û ji bo çi di jiyana de pêdivîyeke sereke ye?

Rastî, perwerde gelek tiştan di hundirê xwe de dihevine, lê em ê di vê gotarê de balê bixşînin li ser perwerdeya zanistî (xwendin û hînbûn)

Perwerde di jiyana me de xwedî cihekî pir girîng e. Armanca sereke ji perwerdeyê ew e ku her mirovek cihekî xwe yê guncav di civakê de bigire û li gorî zanista xwe tev bigere. Her wiha perwerde alîkariya mirov dike da ku zanist û psporiya xwe bi pêş bixe. Mirovê nexwende (neperwerdekirî) nikare bixwîne yan jî binivîse, lewma jî nikare tu agahiyên ku bi rêya xwendin û pirtûkan tên bidestxistin, wergire. Bi awayekî din, ev kes ji tiştên ku li cîhana

derveyîn diqewimin dûr e; li hemberî wê jî, kesê xwende û xwedî zanist, di odeyekê de jiyana dike ku pencereyên wê ji hemû aliyên ve li ser cîhanê vekirî ne. Ji ber vê jî perwerde û fêrkirina baş ayînde û pêşeroja mirov û civakê destnîşan dike.

Fêrkirin ji bo perwerdekirina mejî pir girîng e, ji ber ku alîkariya mejî dike da ku rastî û çewtîyan ji hev cuda bike, biryara rast bistîne û hwd. Îcar divê em baş bizanin ku perwerde û fêrkirin ne tenê hînkirina xwendekaran li ser çawaniya bersivdayîna di ezmûnê de ye, lê belê perwerde ji bo bipêşxistina mejî, faktoreke pir girîng e.

Her wiha perwerde bixwebawerî û geşbîniyê li cem mirov xurt dike û dihêle em karibin xwe bispêrin xwe. Bê xwendin û zanistê, mirov dê nikaribe beşdarî tu guftûgoyan bibe. Ji lew re perwerdeya guncav û baş, bawerîya mirov pê xurt dibe û êdî dikare li hemberî hemû kesan, nerînên xwe bi serbestî di her mijarê de bide.

Perwerde ji pêkanîna hevî û omîdan re jî girîng e, ji ber ku dergehên karên baş ji mirovan re vedike, nemaze ji ber ku pîvana herî girîng di bijartina karmendan de, perwerde ye. Her wiha alîkariya me dike da ku em jiyana xwe ya pîşeyî bi pêş bixin

Em bi rêya fêrbûnê çand û dîroka xwe dinasin û asoyên hişmendiya me ferehtir dibin, ji ber wê jî perwerde destyariyeke girîng dide jiyana me û dihêle em bibin niştecîhine berpirsiyar ku êdî em karibin nîrxên niştecîhbûnê li cem her mirovekî, baştir bikim. Bi rêya perwerdeyê mirov dikare erk û berpirsiyariyên xwe binase, ji ber vê jî mirov nikare rastiya ku dibêje "mîrovên zana, baştirîn niştecîh in" paşguh bike

Jixwe perwerde ji bo zarokan jî pir girîng e, ji ber ku carinan zarok komek helwest û baweriyên şaş di mejiyê xwe de dimeyînin, îcar li vir rola perwerdeyê ew e ku van helwest, hizir û baweriyên nerast ji serê zarokê derxîne.

Her wiha dema ku karmendên xwedî zanist

di welatekî de pir bin dê ew welat ji aliyê aborî û hilberînê ve jî li pêş be, ji ber ku nasîna xwendin, nivîsandin û hişmendiya rexnedar kar bêhtir bi pêş dixin. Ji ber vê jî gelek welatan li ser bipêşxistina sîstemeke perwerdeyê ku karibe kesine xwedî pisporî biafirîne, tekez dikin.

Îcar ji ber van sedeman û gelek sedemên din, girîngiya perwerdeyê her tim xwe dide pêş û her welatekî ku xwedî sîstemeke perwerdeyê ya xurt be, helbet ew welat dê ber bi pêşerojê geş ve biçe, ji ber ku pêşketina welatan girêdayî pêşketina perwerdeyê di wan welatî de ye. ■





PIRSGIRÊKÊN ZIMAN

Tewfîq Sînan

Destpêkê ez her kesê ku di warê zimanê kurdî de kar dike, û her kesê ku hez kir û zimanparêzê zimanê xwe ye spasdikim. Di vê nivîsê de ez dixwazim bal; bikişînim ser hinek pirsgirêkên ku em ji şagirtên xwe dibihîzin, bi taybetî ew şagirtên ku xula fêrbûna zimanê kurdî bi dawî dikin.

Pirsa wan ya gelemper ew e: Gelo çima zimanê me di cihinan de bêhempa ye? Di der barê vê pirsê de min çend nimûne amadekirine ku çaxê fêrkirinê bi min re derbas bûne. Bêguman, di her heşt salên dawî de karekî pir nirixdar û hêja di ware zimanê kurdî de hate kirin, di encamê de û bi dehan pirtûkên ziman derketin holê. Lê dîsa pirsgirêka rêzimna kurdî nehat çaresekirin, çimkî du şîwazên nivîsê ên cuda li nav nivîseran belav bûne, beşek ji nivîserên zimanê kurdî bi pîvera Mîr Celadet Bedirxan dinivîsin û beşek mezin jî li gorî pîvera nûjen dinivîsin, û ev bixwe bûye kêşeyeke zimanî.

Wek em dizanin, heger têbînî li ser encama xebata zimanzanên kurd hebin jî ev nabe kêmanî, ji ber ziman zeryayek mezin û bê dawî ye.

Di rêzimana kurdî de, çend xal hene ku li nava nivîserên kurdî cihê nakokî û pirsgirêkê ne, û ev alozî di dema dawî de diyar bûye û bi riya xwendin û nivîsandina

rojane tê dîtin, her wiha gelek mamosteyê ziman dema ku karê fêrkirina şagirtan dikin li rastî vê pirsgirêkê tên, û şagirt bixwe jî piştî demek kin ji fêrbûnê pirsgirêkan şanî mamosteyan dikin û li vir mamoste dikeve qulçikik teng ku nikare bersiva xwe bide. Bi rastî ev ne sûcê şagirt û mamosteyan e, şagirt ji hez kirina xwe ji zimanê xwe vê têbîniyê dibêje û dixwaze zimanê wî tekûz û bêkêmanî be. Bê guman ne mamoste û ne jî şagirt naxwaze zimanê wî lawaz be.

Aniha ez ê mînakinan ji pirsgirêkên zimanî destnîşan bikim:

1-Navdarên ku bi tîpên (ê-î) bi dawî dibin û şîwazê nivîsîna wan dema ku tîpa (y) bi wan vedibe mîa jêr:

Rî: Riya/Rîya

Rê: Riya/Rêya

Pî: Piya/Pîya

Pê: Piya/pêya

Di mînakên jorîn de em du şîwazên nivîsê dibînin, di mînaka yekem û duyem de heger tu wekî herdiwan bimeşî tê bikeve bin pirsê de. Lê çima em hemû venagerin rêziman M.Celadt Bedirxan ya bi zimanê Ferensî nivîsandîye, ku dibêje: Heger tîpa Ê berî Y were, ew sivik dibe û dibe E

Rê: Reya min, Dê: Deya min, Sê: Seyem

Û heger tîpa Î berî Y were sivik dibe û dibe I.

Rî: Riya min

Jîn: Jiyan

Azadî: Azadiya

Pirsgirêka duyemîn ev e: Tîpa dengdêr nabe li pey tîpa dengdêr were

Axaftin= Diavaxim. Biavaxim

Êş= Diêsim. Biêsim

Li gor rexneyên me û şagirtên nûjen ev der mafê ziman de şaştîyek e. Ka em vegerin M.Celadet û em bibînin ew derbarê vê yekê de çi dibêje:

Divê em vegerin jêdera van bêjeyan ya kevnar an jî gerek em (') binivîsin

Jêdera kevnar ji van bêjeyan re bo mînak: Hêş şeweya nûjen jêre Êş e, Haxaftin şeweya nûjen jêre axaftin e,

Haxaftin dibe: ez dihaxivim. Hêş dibe ez dihêşim

Çareseriya din ji bo vê pirsgerêkê ew e ku wekî zimanê Ferensî bêne nivîsîn.

Axaftin: Ez di'axivim, Ezê bi'axivim. Êş: Ez di'êşim, ezê bi'êşim.

Heger em baş raçavkirinê bikin emê bibînin wekî M.Celadet her tîpek cihê xwe digire û hevrêziyek ciwan ji zimanê me re çêdibe.

Bi rastî herkes dixwaze zimanê wî tekoz û bêkêmanî be û ji ber vê her mamosteyek an şagirtêk gava van têbîniyan dibêje gerek bibe cihê guhdariyê û korseyek ziman yekbûyî (komplks) çêbibe da ku van pirsgerêkan ji holê rakin,

Di baweriya min de, rêzimana M.Celadet ji bo ziman kurdî hîn yekemîn rênîşana hempa ye, ji ber bi zimanên cîhanê re hevseng kiriye û her tişt şanî me daye. ■

تنمة المقال: فرانز كافكا

أعماله توضع من قبل النقاد والمختصين في خانة الأعمال الكابوسية المخيفة. لقد كان مرض كافكا " السل " وكان ذلك سبباً لوفاته وهو في الأربعين من عمره تقريباً. لقد كتب كافكا لعشيقته " ميلينا " قبل أن يموت : " حياة الكتاب تبدأ بعد موت مؤلفه أو بالأغلب بعد وفاته بفترات . فأولئك الرجال التواقون يجاربون من أجل قصصهم وحتى بعد موتهم ، ولكن حينها فقط يترك الكتاب لوحده ويبدأ يستمد القوة من ضربات قلبه. " وهذا ما حدث لكافكا الذي حاز على الشهرة الواسعة لا بل المنقطعة النظير بعد وفاته. بقي أن نقول ، أن كافكا رسم اللوحة الأدبية السوداوية والمأساوية بألوان العبث والاعتراب . إنه كاتب لا يستطيع أن يضحك مجاملة مع الآخرين لأن كل شيء فيه يبكي وينتحب بطريقة مذهلة ، تعكس على أدبه لون الوجود الإنساني البائس الذي يذرف دموعاً مدرة في أدبه الخالد خلود الوجود نفسه. ■



فرانز كافكا

بقلم : الكاتب والصحفي محمد عبد الوهاب

7

الحرية الذي ابتكره للبوح ولو مرةً في حياته . كما ظهر هذا الأب في كتابه "الحكم" حيث يقبل الشاب بطل الرواية ، حكم الموت الذي أصدره عليه والده المدعو " ويغرن ". ومن نافل القول : أن كافكا كان نباتياً حيث كان يشعر بالاشمئزاز من أكل اللحوم !.

وجديرٌ ذكره أن كتابات كافكا قد تعرّضت فيما بعد للحرق على يد هتلر وتعرّضت مؤلفاته لموقفين متناقضين من الدول الشيوعية في القرن الماضي ، فقد بدأت بالمنع والمصادرة وانتهت بالترحيب و الدعم ، توفي كافكا عن عمر 14 عاماً.

كتب صديقه وطيبه الذي يرعاه في أيامه الأخيرة " وجهه جامدٌ صارم ، مترفعٌ مثلما كان ذهنه نقيّاً صارماً "

إن أعماله تُصنّف بكونها واقعية عجائبية ، عادةً ما تتضمن قصصه أبطالاً غريبين الأطوار ، يجدون أنفسهم وسط مأزقٍ ما في مشهدٍ سريالي ، يُعزى ذلك للمواضيع النفسية التي يتناولها في أعماله مثل الاستلاب و الاغتراب الاجتماعي والقلق والذعر والشعور بالذنب والعيشة ، إنه الأديب الأوديسي بكل ما تحمله الأوديسية من مجازر نفسية لا فكاك منها ، وُصمت حياته بالوجع والرعب وكل مفردات التيه والاضطراب الوجودي.

يمكن القول أيضاً أن كافكا أصبح رائداً للأدب العبثي تماماً بعد صدور روايته " المسخ " التي تعبر عن مكنوناته النفسية المضطربة ، حيث عانى من ظروف أسرية وعاطفية معقدة انعكست بقوة على أدبه و الذي عانى الأرق وهي السمة الأكثر بروزاً عن حياته القلقة التي عاشها ولهذا السبب تُعد رواياته وقصصه القصيرة عبارة عن عوالم نفسية تغوص في أعماق النفس البشرية ، فتعريها وتنزع عنها كل غطاء ، فتبدو حالكة وهي تصور رحلة الإنسان الوجودية على أنها رحلة إلى المجهول والعدم والعبث ، وهذا ما جعل

الدخول إلى الأدب العبثي من خلال شرنقة الأب المستبد المؤلمة فرانز كافكا ، عملاق من عمالقة الأدب الألماني ، هو كاتب تشيكي يهودي ولكنه كان يبدع باللغة الألمانية ، ويقول عنه أحد النقاد : بأنه " رائد الكتابة الكابوسية في أعماله " كان كافكا روائياً يهودياً برهيمياً وكانت جنسيته ألمانية ، كتب الرواية والقصة القصيرة ، إنه أسطورة الأدب في القرن العشرين ، وموضوعاته كما تظهر في كتبه ، تستند إلى الاغتراب والقلق الوجودي والشعور بالذنب ، وتعتبر رواية " المحاكمة " التي كتبها بين عامي 4191 – 5191 من أفضل كتبه ، ونُشرت بعد وفاته عام 2591 وهي واحدة من أشهر أعماله . ولا تنافسها إبداعاً سوى رواية " المسخ " والتي نشرت لأول مرة عام 5191 وهي ذات أجواء كابوسية تعبر عن الوجدان الإنساني ، ولا شعور الإنسان الذي يعاني من مركبات النقص ، حتى أن بطلها يجد نفسه حشرةً مرفقةً تفنن كافكا في رسمها

ولد كافكا في 3 يوليو عام 3881 ومات في 3 يونيو 5291 تعلّم كافكا الكيمياء والحقوق والأدب في الجامعة الألمانية في براغ عام 1091 ، ولد لعائلة يهودية ، وخلال حياته تقرب من اليهودية ، حياته كانت مليئة بالحزن والمعاناة وكان يعاني من سطوة أب قاس ، لقد كان مثقفاً حساساً وقع تحت حكم والدٍ مستبدٍ وقوي منذ نعومة أظفاره . كانت ذاكرته متألمة من أبيه ، ويحكى أن الطفل فرانز ذات مرة تبوّل في فراشه ، فقام الأب في فصل البرد القارس بطرده إلى شرفة الدار و إغلاق الباب عليه ليمضي ليلةً في ذاك الصقيع بسبب ارتكاب الطفل لهذا الجرم الكبير !! . وكثيراً ما أراد كافكا وحاول أن يسمح له والده بالبوح بمكنوناته وخبائيا روحه ولكن دونما جدوى ، فالحنون في داخله وردّهات روحه من الأب جعله صامتاً ، ولهذا السبب قام بكتابة كتابه " رسالة إلى والدي " هذا الكتاب هو الذي منحه سرد آلامه لوالده المستبد الذي لم يبال بكل ما سرده من آلام في حين

_وفي سؤالنا عنمن يستطيع الادعاء في حال وقوع جريمة الاغتصاب؟ أجابنا محمود:
ان كانت الفتاة قاصر، فيحق لأهلها الادعاء، وان كانت متجاوزة للسن القانوني فهي تستطيع الادعاء.

وفي الحلقة الرابعة استضافنا ايضا الناشط المدني غاندي سعدو والحقوقي وليد محمود.. وتحدثنا فيها عن حق عوائل داعش في العودة الى بلدانهم.

ملخص الحلقة الرابعة

في سؤالنا عن دعم عوائل داعش نفسيا أجابنا غاندي سفر:

_دعنا نتكلم أولا عن العنف ضد المرأة أو ما يسمى تعنيف النساء لقد قمنا بعدة أنشطة وحملات مناصرة لتسليط الضوء على هذه القضية، فالموضوع متشعب جدا ومن الصعب السيطرة عليه، و الورشات التدريبية التوعوية غير كافية لتلبية حجم المشكلة التي تواجهنا. يجب علينا انشاء برامج توعوية ونشاطات في المجتمعات التي عانت من ظلم تنظيم داعش، كي نستطيع تجاوز الامر برمته.

_وفي سؤالنا عما اذا كان يحق لنساء داعش العودة الى أوطانهم في حال تم تجريهم، أجابنا وليد محمود عن ذلك
_من تم تجريه لا يستطيع العودة إلى بلده، فهو ليس أمرا اختياريًا او كيفيًا، يجب فرز النساء اللواتي تلطخت أيديهن بالدماء عن البريئات، قد تكون هناك مجموعة منهن أجبرن على الانضمام للتنظيم، او قد تكون احداهن اغتصبت و أصبحت زوجة لأحد مقاتلي التنظيم. في النهاية لم يتم التوصل إلى صيغة معينة حول عودة عوائل داعش الى بلدانهم.

وفي الحلقة الخامسة استضافنا نائب الرئاسة المشتركة في حركة المجتمع الاسلامي الديمقراطي الملا عبدالرحمن بدر خان.
وتحدثنا فيها عن الاسلام في منظور داعش وطريقة تطبيقه على الناس..

ملخص الحلقة الخامسة

الملا بدرخان، ما هي المهام المترتبة على المؤسسات الدينية في ابعاد نساء داعش عن التطرف؟

ج-لا بد من تعريف الدين الاسلامي الذي يحمل في طياته البنية الجذرية لهذه الكلمة أي (سلام)، فالإسلام جاء من السلام. من الاشياء التي تبناها مجتمع الاسلام الديمقراطي، هو السلام فالمدارس الشرعية إن كانت اسلامية او مسيحية او ايزيدية تتبنى كلمة السلام.

-وفي سؤالنا عن مدى تقبل عوائل داعش للمصلى الذي بناه حركة المجتمع الاسلامي الديمقراطي في مخيم الهول، أجابنا بدر خان:

_المصلى كان للرجال، فعندما يخرج الرجل من المصلي ويرجع الى عائلته، يقوم ضمينا بنشر الوعي الذي تلقاه فتقبل حينها العائلة ما قمنا بتعليمه لانقاذهم من الظلام الذي هم فيه.

_هناك نشاطات نقوم بها لتغيير مفهوم داعش لدى النساء اللواتي يقطن في المخيم.

_الاسلام يبحث تصحيح اخلاقيات المجتمع واخراجه من غياهب الظلمات الى النور



أهم محاور رايات السلام

راديو ولات يلقي الضوء على واقع أطفال و نساء داعش في مخيم الهول

تقرير راديو ولات



لا يزال الكثير من أطفال ونساء داعش مهمشين داخل مخيم الهول للاجئين السوريين والعراقيين، حيث يعج هذا المخيم بالآلاف منهم مما يجعلهم كتلة خطيرة من التطرف.

من أجل ذلك قمنا وبالتعاون مع منظمة press free unlimited بإعداد برنامج مؤلف من خمس حلقات يسلط الضوء على هذا المخيم. في الحلقة الأولى استضفنا الناشطة المدنية نجلاء تمو والحقوية نالين عبدو.. حيث تحدثتا عن واقع أطفال داعش و نظرة المجتمع السلبية لهم .

ملخص ما جاء في الحلقة الأولى

س- استاذة نجلاء كيف لكم ان تساهموا في تغيير نظرة المجتمع السلبية تجاه اطفال داعش؟

ج- عندما سمعت باسم مخيم الهول تصورت أول مرة وكأنه مخيم عادي كباقي المخيمات، لكن عندما دخلت اليه وجدت بأنه عالم آخر و دولة أخرى اذا صح التعبير، فعدد المقيمين فيه يزيد عن 70 ألف ، 13 الف منهم يحملون جنسيات أجنبية ، حقا أنها كارثة بكل معنى الكلمة.

لقد قمنا بزيارة المخيم واتطلعنا على أحوال نساء وأطفال داعش ونقوم الآن باقامة برامج توعية لهم كي يستطيعوا تجاوز الضغوط النفسية التي يعانون منها.

2س- استاذة نالين ما هي الرؤية القانونية تجاه هؤلاء الاطفال؟

في الحقيقة جميع القوانين الدولية لم تكن مستعدة في يوم من الايام كي تواجه هذه المشكلة، فداعش تنظيم ارهابي عالمي وتم تجميع ما تبقى منه داخل مخيم الهول، والمجتمع الدولي عاجز حتى الان عن حل هذه المعضلة، بالكاد يستطيعون تصنيفهم، فالمخيم قبلة بشرية موقوتة.

أما عن القانون، فأى قانون يحمي الأطفال بغض النظر عن عقيدة او ايديولوجية ذويه؟

وفي الحلقة الثانية استضفنا أيضا الحقوية نالين عبدو والناشطة المدنية نجلاء تمو..

تحدثنا حينها عن دور مؤسسات الادارة الذاتية ومنظمات المجتمع المدني في ابعاد نساء داعش عن التطرف.

-ملخص الحلقة الثانية

س -استاذة نجلاء ما هو دوركم كمنظمات مجتمع مدني في دعم نساء داعش للابتعاد عن التطرف؟

ج-توجد مراكز مختصة ومستوصفات كما يوجد أطباء وكل

منهم يقوم بدوره على قدر طاقته، فنساء وأطفال داعش يعانون من ضغوط نفسية كثيرة وأيضا من طقس الصيف الحار وكذلك الحال في الشتاء، فهم لا ينفكون عن الشكوى من هذا الحال فكيف لنا ان نكون قادرين على مساعدتهم ما لم نتكاتف جميعا.

وفي سؤالنا عن كيفية محاكمة نساء داعش المرتكبات لجرائم قانونية، أجابتنا الاستاذة نالين عبدو عن ذلك و قالت:

الادارة الذاتية تتعامل معهن حسب معيارين، المعيار الأول هو المعيار الانساني، والثاني هو معاملتهن على أنهن أسرى حرب، وعدد كبير منهن من الجنسية العراقية، هذه الشفافية في التعامل معهن توقعهن في مشاكل عديدة، فعندما تقوم قوات الأسايش بالتعامل مع النساء برفق يتفاجؤون بكمية العنف لدى هؤلاء النساء.

وفي الحلقة الثالثة استضفنا الناشط المدني غاندي سعدو والحقوقي وليد محمود.. وتحدثنا خلالها عن جرائم الاغتصاب التي تعرضن لها الكثير من النساء خلال حكم داعش.

ملخص الحلقة الثالثة:

س- استاذ غاندي انتم كمنظمات مجتمع مدني كيف لكم ان تسلطوا الضوء على حالات الاغتصاب داخل مخيم الهول؟

_الاغتصاب يندرج ضمن بند العنف ضد المرأة، في المخيم تكون هناك حالات خاصة وبأطر مختلفة، فمجتمعا عانى من حروب، موضوع الاغتصاب لا يتعلق بأمور طبيعية او فيزيولوجية وانما بأمور عقائدية أيضا، فمجتمعا بشكل عام لا يستطيع ان يتكلم بأمور خاصة بالمرأة بشكل صريح وحققي ، كي نعالج المشكلة بشكل ملموس، فكثير من المنظمات تتجنب الحديث عن هذه القضايا.

وفي سؤالنا عن حكم جريمة الاغتصاب، أجابنا وليد محمود عن ذلك؟

_جريمة الاغتصاب جريمة جنائية الوصف، ويعاقب مرتكبها بعقوبة جنائية لا تقل عن خمسة عشر سنة في السجن، وتجريد مدني، حيث تتنوع العقوبات بحسب ظروف الجريمة.



ZANÎNGEHA ROJAVA, RÛGEHA ZANISTÊ LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

Nêçîrvan Ebdul'ezîz

Di nava bizava pêşketin û pêşveçûna ku ev demeka nedirêj li rojavayê Kurdistanê dest pê kiriye da, nexasim di milê perwerde û fêrkirinê da. Herweha weke pêwîstî û pêdivîyeka jêner ku xwe li qada perwerdeyê sepan. Zanîngeha Rojava weke bersivê ji vê pêvajoya hestiyar ra hat. Di tîrmeha sala 2016an da li bajarê Qamişlo û bi serperîştîya Desteya Perwerde û Fêrkirinê, duyemîn zanîngeh piştî Zanîngeha Efrînê li rojavayê Kurdistanê hat damezirandin. Piştî demeka kurt şaxên xwe li bajar û bajarokên din ên rojavayê Kurdistanê belav kirin.

Piştî derbasbûna zimanê kurdî li zimanê perwerdeyê û fêrkirina xwendekarên dibistanan bi zimanê dayîkê, dema avakirina zanîngehekê hat ku ev xwendekar xwendina xwe lê berdewam bikin. Ji lew ra Zanîngeha Rojava weke çare û gaveka dîrokî, xwe li ser zimînê da pêş. Di sala xwendinê ya yekemîn 2016\2017 da nêzî 300 xwendekarî tev li zanîngehê bû, lê ev jimar di sala xwendinê ya 2017\2018 da gihaste 720 xwendekarî û bi vî awayê sal bi sal jimara xwendekaran bi jor dikeve.

Di sîstem û pergala xwendin û birêvebirinê da zanîngeh xwedî sîstemeka cihê ye. Çimkî ji dêl sîstema

ezmûnan a kilsîkî ve , sîstema nirxandinê bingeh girtiye. Çimkî li gorî Raman Hisên mamoste û endamê Rêveberîya Fakulteya Zanistên Perwerdehîyê; rêbaza ezmûn û testên kilsîk, di kesayeta xwendevanan da taybetîyên jiberkirin û ezîtîyê ava dike. Herweha di nava 1-2 demjimêran da, ast û jêhatîbûna xwendevan nikare bi temamî bihê dîyarkirin. Ji hêlaka din ve xwendevan gelek caran di alîyê derûnî da dikevin bin pest û givaşekê da û tevî ku zanebûna wan heye jî lê nikarin pileyên baş wergirin. Lê belê dîsa li gor sîstema zanîngehê, pergala nirxandinê beşeka sereke ji pergala perwerdeyê ye. Armanca pergala nirxandinê ne ew e ku di nava xwendevanan da yê baş û nebaş an jî jêhatî û ne jêhatî dîyar bike, lê belê armanc bipêşxistina asta xwendevanan û sererastkirina kêmasî û şaşîyên heyî, bi rê û rêbazinên afrîner e. Di pergala nirxandinê da ev mijar bingeh dihên girtin:

1. Berpirsyarî, pêkînanana xwendevan ji erk û karên xwe ra.
2. Tevlîbûna li waneyê.
3. Afirînerî û jêhtîbûn.
4. Karkirina bi awayekî kolektîf û kombendî.
5. Têgihiştin, şîrovekirin û bikarînanana zanîn û agahîyan.

Herweha birêvebirina zanîngehê û fakulteyên wê, bi pergala serkoatîya hevbeş bi rê ve diçe. Biryarên ku der barê zanîngeh û xwendekaran da derdikevin jî bi kombûyîna ji hêla; Encumena Rêveberîyê, Encumena Zanîngehê, Encumena Jinê û Encumena Xwendekaran ve dihên girtin. Têkilî û peywendîya di navbera xwendekar û mamoste da têklîya hevaltî û hevkarîyê ye. Jixwe tevlibûna xwendekar li zanîngehê bêhember e, anku zanîngeh tu diravan li hemberî fêrkirina xwendekaran wernagire. Herweha erkê raberkirina xwegehan ji kesên ku ji gund û bajarên dûr dihên zanîngehê, girtiye li



ser milê xwe.

Zimanê perwerdeyê li zanîngehê bi du zimanan e. Yek jê kurdî û yê din jî zimanê erebî. Li gorî vê Zanîngeha Rojava li 12 fekulte û peymangehan şax dibe. Fakulte û peymangeh hemû ne li bajarekî ne, lê belê li gorî berjewendîyên xwendekaran û pêdivîyan, fakulte û peymangehan cihê xwe li hemû bajarên rojavayê Kurdistanê girtine. Fakulte û peymangehên zanîngehê li gel cihê wan û salên xwendinê weha rêz dibin:

- **Fakulteya Zanistên Perwerdehîyê** (bîrkarî, fîzîk, kîmya, zanyarî, dîrok, erdnîgarî, mamostetîya refê). Li **Qamişlo** cih digire û xwendina wê **4 salan** dom dike.
- **Fakulteya Jineolojî**, li **Qamişlo** cih digire û xwendina wê **2 salan** dom dike.
- **Fakulteya Wêjeya Kurdî**, li **Qamişlo** cih digire û **4 salan** dom dike.
- **Fakulteya Hunerên Bedew**, **Qamişlo**, **4 sal**.
- **Fakulteya Endazyariya Petrolê**, li **Rimêlan** cih digire û xwendina wê **5 salan** dom dike.
- **Fakulteya Endazyariya Petrokîmyayê**, **Rimêlan**, **5 sal**.
- **Fakulteya Endazyariya Çandinîyê**, **Qamişlo**, **5 sal**.
- **Fakulteya Avahîsazîya Ekolojîk**, li **Hesekê** cih digire û xwendina wê **5 salan** dom dike.
- **Peymangeha Bilind a Mekatronîkê**, **Qamişlo**, **3 sal**.
- **Peymangeha Endazyariya Sivîl**, **Hesekê**, **2 sal**.
- **Peymangeha Wergera Ingilîzî**, **Qamişlo**, **2 sal**.
- **Peymangeha Rêveberî û Darayî**, **Qamişlo**, **2 sal**.

Raman Hisên bi ser ve zêde kir û got: Ji bo ku sîstemên heyî ku hemû wargehên zanist û xwendinê li yek bajarî kom dibûn, li rojavayê Kurdistanê bi cih nebin, şaxên Zanîngeha Rojava ne tenê li Qamişlo man, lê li gorî mercên heyî xwe gihandine bajarên din. Çimkî

kombûyîna hemû fakulte û peymangehan li bajarekî, dibe ku ji ber sedemên cuda cuda derfetê nede nişteciyên bajarên din ku tev li wê zanîngehê bibin. Ji lew ra wekî mînak ji ber ku zevîyên petrolê bi piranî li Rimêlanê cih digirin, Fakulteya Petrolê û ya Petokîmyayê li Rimêlanê hatin damezirandin. Ji bo ku xwendekar di milê piratîkê da ji karê ku berê wî lê ye, nêz be. Zanko peywendîyên xwe bi zanîngehên derve ra xurt dike. Şandeyên derveyî her dem serdana zanîngehê dikin û wê ji nêz ve lêkolîn dikin. Li milê din jî şandeyên zanîngehê serdana zanîngehên derve dikin û ji serborên wan sûdê werdigirin. Herweha zanîngehê peymaneka hevaltî û hevkarîyê bi Zanîngeha Californiayê ra girê daye.

Zanîngeha Rojava ji destpêka avabûnê ve û ta niha di nava hewldanên pêşketinê da ye. Pêşketina ji her hêlê ve çî bi avakirina fakulte û peymangehên nû, çî jî bipêşketina di milê pergala perwerdeya ku lê tê dayîn da, herweha pergala nirxandina ku wekî bingeş dişopîne. Hêja ye zanîne ku niha hevryazya sala xwendinê ya nû li zanîngehê lidar e ku xwendekar ji hemû bajar û bajarokan dihên, da ku qurtekê ji ava vê zanîngehê vexwin û bibin avakerê ayindeya vî welatî. ■



AYAZ YÛSIV ZAXOYÎ **(1961-1986)**

Hunermend, mûzîkjen û degbêjê navdar Ayaz Yûsiv li bajarê Zaxo yê başûrê Kurdistanê sala 1961ê ji dayik bûye, lewre ew bi nasnava Ayazê Zaxoyî hate naskirin.

Xwendina xwe ya seretayî û navendî li bajarê xwe kuta kir.

Li nav malbateke hunerî ku bi navê (malbata dengxweşan) hatibû naskirin, û li nav xwezayeke pir ciwan Ayaz mezin bû. Behreya wî û hezkirina wî ji hunerê re ji zaroktiya ve diyar bû. Di ahengên dibistana seretayî de stiran digotin. Dengê wî yê zîz û zelal bala ap, bira û bapîrê wî kişand, û bi birayê xwe Remedan Yûsiv (Baran) re derdiket şahî û ahengan, û ji wê hingê ve da ser riya hunerê .

Xwe fêrî lêdana li ser tembûr û ûdê kir û xwe berda warê mûzîk ûstiranbêjîyê.

Sala 1980 kasêta xwe ya yekem tomar kir û bi riya vê kasête navûdengê wî li seranserê kurdistanê balav bû, her weha aheng, şevêrk û şahî li gel hevalên xwe hunermend Erdewan û Sebah Zaxoyî li dar dixistin, vê yekê hişt ku di nav gel de bê naskirin û hezkirin.

Herdu stiranên wî (Biskê te zirav in) û (Heger dinya hemî gul bin) bi rengêkî pir mezin û kargêr deng vedan, ev herdu stiran ji gotinên helbestvan Ebdulezîz Silêman û helbestvan Beşar Zaxoyî ne û ji awaz û stirana Ayaz Yûsiv in.

Li Bexdê û dema ku ji bo leşkiriye hatibû kişandin çend aheng li dar xistin.

Di 19-4-1983an de kasêteke pir giranbuha û bi mûzîkeke pêşketî derxist, stiranên wê ji gotinên helbestvan Ebdulezîz Zaxoyî bûn. Ev karê hêja bi rengêkî berfireh belav bû .

Di sala 1984an de 13 stiran li radyoya Bexdê



tomar kirin, û li her deverê hatin guhdarkirin.

Piştî ji kaniya folklorê kurdî, li kêleka hinek stiranên ku ji gotinên helbestvanên mîna (Ebdulezîz Silêman, Hebîb Keleş, Bedirxan Sindî û Sebrî Botanî) û ji awazên Semîr Zaxoyî bûn karekî din derxist.

Sala 1985an bi alîkariya Koma Dihokê çend stiran û klîp tomar kir.

Ji ber nexweşiya silê, hunermendê bejinbilind Ayaz Yûsiv di 26-1-1986 de koça dawî kir û ew hîn di buhara temenê xwe de bû. Bê guman koçbarkirina wî ya zû ji bo huner û dengbêjiya kurdî xisareteke mezin bû.

Termê Ayaz yê pîroz li ser Milan hate hilgirtin û li gorî wesîtiya wî li ber stirana wî ya "Welatê Min Bexçê Gulan" li bajarê Zaxo ji bo xakê hate spartin. ■



أفسان كردي

مشروع تعبيد الطرقات بعامودا بين رضى البعض وحسرة آخرين

شديد و هذا يستغرق الكثير من الوقت كما أن تلك الطرق تسبب الكثير من الأذى لسياراتنا و تنزع الدواليب او الدوزان وغيرها وفي أحيان كثيرة يرتطم أسفل السيارة بالأرض بسبب عمق الحفر مما قد يتسبب بالتواءات أو كسور و كل الطرق الرئيسية و الفرعية باتت غير صالحة للسير .

حسين أوضح أن سبب اهتراء تلك الطرق هي الإهمال وعدم الإصلاح لفترة طويلة وهناك أيضا أسباب أخرى مثل قيام الأهالي بتمديد شبكات صرف صحي وردم مكان الحفر بالتراب فقط و تابع حسين بأنه يتوجب على البلدية بضرورة الزام هؤلاء الناس بتسوية مكان الحفر بالإسمنت على الأقل وخاصة المتعهدين الذين يقومون ببناء المباني بهدف التجارة و الربح فهم لا يلتزمون بصيانة الطرقات بعد الانتهاء من أعمال البناء.

أما السيد عبد الجبار محمد و هو مواطن من عامودا فقد تحدث لمجلة ولات و قال:

على الرغم من البدء بتعبيد بعض الشوارع من قبل بلدية الشعب إلا أن العمل ليس بالمستوى المطلوب فتخصيص عدد من الطرقات لإصلاحها لا يعد كافيا لأن كل شوارع المدينة مهترئة وهذه الشوارع تسبب معاناة للأهالي ولا سيما في فصل الشتاء لذلك نحن نتمنى من المسؤولين في البلدية صيانة كافة الطرقات وحتى ان كانت مجرد ترقيع كما نتمنى من الأهالي القيام باصطلاح وصيانة شبكات الصرف الصحي الخاصة بهم قبل بدء البلدية بتعبيد الشارع شوارعهم كي لا يقوموا بأعمال الحفر بعد ذلك و يخربوا الطرق وفي النهاية نشكر جهود القائمين على مشروع تعبيد الطرقات ونتمنى ان تشمل كل المدينة قبل فصل الشتاء.

جدير بالذكر بأن أعمال تعبيد الطرقات تشمل معظم مناطق الادارة الذاتية لكن نوعية المجهول الزفتي و ضعف الخبرة اضافة الى ظهور حالات الفساد لدى الشركات المتعهدة تؤثر سلبا على جودة العمل.

بعد فترة طويلة من الإهمال وعدم المبالاة من البلدية تحولت معظم الطرقات في مدينة عامودا الى حفر وبرك للمياه لاسيما بعد موسم وفيير من الامطار التي هطلت هذا العام. أصبحت جميع الطرقات غير صالحة لسير السيارات و حتى المشاة، و نتيجة لضيقها تشكل الاختناقات المرورية، هاجساً يومياً للعابرين عليها ركوبا و مشاة، و أصبح التنقل داخل المدينة والخروج منها هاجسا بالنسبة للمواطنين وأصحاب العربات المختلفة. أغلب حوادث المرور تكون بسبب اهتراء الطرقات، حيث تكثر الحفر القاتلة في الطرقات السريعة وغياب الإنارة العمومية. بعد فترة من وعود بلدية الشعب للمواطنين بالعمل على تعبيد الطرقات و اصلاحها

باشرت الدائرة الفنية في بلدية الشعب في عامودا التابعة للإدارة الذاتية بتنفيذ مشروع مد وترقيع الطرق بالمجهول الزفتي، وبحسب البلدية سيتم تنفيذ كمية 2220 متر مكعب من مجهول الزفتي منها 1820 متر مكعب مد و 400 متر مكعب ترقيع وقد تم تحديد بعض الشوارع التي سيتم مدها بالمجهول الزفتي وهي الشوارع الرئيسية و الشوارع الفرعية ضمن المدينة وقد بدأ المتعهد برش مادة mco في بعض الشوارع التي سيتم مدها بالمجهول الزفتي

وذكرت البلدية كلفة المشروع والتي تقدر ب 50 مليون ليرة سورية للتعرف على آراء المواطنين حول هذا العمل قمنا باستطلاع بعض الآراء:

السيد هشام حسين و هو صاحب سيارة خاصة تحدث لنا عن مشروع التزفيت التي قامت بها بلدية الشعب بعامودا و قال: هذا المشروع رغم انه جاء متأخرا لكنها خطوة جيدة من قبل بلديتنا

أغلب الشوارع وبنسبة ٧٥ بالمئة مهترئة وتحتوي على حفر ولم تعد صالحة للسير ولكي نعبر تلك الطرق بالسيارة يجب ان نمشي ببطء

FERHENGOK

zordestî	استبداد
çewsîn	اضطهاد
Serwerî	سيادة
dagîrkerî	احتلال
hevsengî	توازن
berevanî	دفاع
berxwedan	مقاومة
pozberî	تحدي
redkirin	رفض
pejirandin	قبول
mangirtin	اعتصام
xwepêşandan	مظاهرة
rêkeftin	اتفاقية
rijdbûn	اصرار
hevpeymanî	تحالف
artêş	جيش
efser	ضابط
serperiştî	رعاية
çavdêrî	مراقبة
ewlehî	أمن





SAZÎYA ZIMANÊ KURDÎ DI BUHARA ÇUYÎ DA DÎSA JI NÛ VE PIŞKIVÎ

Rapor: Kovara Welat

Di 15ê gulana 2019an da û bi armanca bixwegirtina erkê xwe yê bingeîn, Sazîya Zimanê Kurdî (SZK) bi regekî nû derîyên xwe vekirin. Di heman roja ku Mîrê zimanê kurdî Celadet Bedirxan, abeçeya kurdî bi tîpên latînî di Kovara Hewarê da rêz kir û dest bi rêwîtiya saxkirina vî zimanî kir, SZKyê jî birêxistinkirin û berdewamiya wê rêwtîyê danîn li ser milê xwe û bipêşdameşîya. Biahengeka bedew ku hemû sazîyên civaka sivîl, yekîti û desteyên têkildarî zimanî û birek ji ronakbîr û zimanhezan beşdarî bûn, sazîyê di Roja Zimanê Kurdî da mizgînîya destpêka serdemeka nû di pêvajoya bipêşveçûna zimanê kurdî da, da. Çimkî piştî perwerdekirina civakê û derbaskirina zimanê dayîkê li dibistanan, sazî li kar û armancên xwe vegerîya.

Endamê sazîyê M. Izedîn Mihemed der barê rewşa zimanî da ji kovara Welat re got: "Ji ber ku ziman ji hebûnê bi sê-çar qaseyan bi wir da ye, her û her dijmînên kurdan destên xwe dirêjî zimanê kurdî kirine û xwestine bi rêya tunkirina zimanî, kurdan ji holê rakin. Lê kurdan tu carî serî li ber vê yekê netewandiye û şoreşa zimanî ji destpêka dagirkirina xaka Kurdistanê ve, dest pê kiriye. Rewşa zimanê kurdî di gelek qonaxên zehmet û hestiyar ra derbas bûye. Mixabin zimanê kurdî mîna gelek zimanên cîhanî ku salane

nêzî deh zimanan tûşî qirkirinê dihatin; zimanê kurdî ew êş dikişand. Lê îro roj em dibînin ev rewş hatiye guhertin, rewş gelekî ber bi başbûnê ve diçe. Êdî zimanê kurdî ji wê qonaxa reş ya ku her dixwest hebûna xwe bisepîne, derketiye. Êdî dezgeh û sazîyên kurdî ava bûne û ziman ji qonaxa qirkirinê derbasî qonaxa bipêşketinê bûye."

Armanc û pilanname

Li gorî pêdivî û mercên demê, SZK pilanname û aramncên xwe zelal dike, herweha pergala karê xwe jî ronî dike.

Yekkirin û standardkirina zimanî

Ji bo çareserkirina arîşeyên ku zimanê kurdî tûşî wan dihe û danîna bingeheka qayîm û zanistî ji zimanî ra; herweha ji bo ku gelê kurdistanî li her çar parçeyan bi yek teşe û celebî bixwîne û binivîse, Sazîya Zimanî dest bi civandin û komkirina zimanhez û zimanzanên deverê kir û bi armanca standardkirina zimanî bi Zanîngeha Rojava, Komîteya Giştî ya Rêvevirina Dibistanan û dildarên zimanî ra, kete amadebaşîya seranserî da. Kar û xebata li ser vê yekê jî berdewam e. Li gorî wê, gengeşe û giftûgo li ser Rêbera Rastnivîsînê di civînên SZKyê da dihe kirin. Komxebata Kurmancîyê (Rêbera Rastnivîsînê) jî ji hêla birek ji zimannasên zimanê kurdî ve ku ji her çar parçeyên Kurdistanê tev lê bûbûn, hatiye amadekirin; ew jî piştî ku pirtûka Mistefa Aydoganî ya bi heman navî wekî bingehe hate girtin. Li gorî endama SZKyê m. Gulê Hesen rêka civînan bi piranî ber bi bingehgirtina pirtûka Rêbera Rastnivîsînê ve diçe ku di civînan da 7 xalên pirtûkê yên ku di nivîsîna heyî da guherîn çêkirene, li ser wan xalan gengeşe lidar e.

Perwerdekirina endaman

SZK ji bo perwerdekirina endamên xwe, demeka bi qasî 6 mehan vediqetîne. Di wê demê da dê endam di milê rêzman, dîrok, erdnîgarî, wêje, teknîk û zaravayên kurdî da bihên perwerdekirin. Çimkî li gorî birêveberên sazîyê, ta ku lêkolîn bi awayekî zanistî û li gorî pîvan û rêzkên cîhanî di mijarên zimanê kurdî da bihên kirin, divê kesê lêkoler di wan biwarên navbirî da xwedî



paşxaneyeka dewlemend û xurt be. Lewra di lêkolînan de gihastina encama herî nêz ji rastîyê, pêwîstiya wê bi van xalan heye.

Damezirandina malpereka elektronîk

Ji ber ku dem dema teknîkê ye û rêka gihastina her deverê di torên enternetê ra derbas dibe, SZK dike malperêkê ava bike. Malper dê derîyê xwe ji her kurdekî ra veke ku li gorî berpirsên sazîyê; her kurdek li seranserî cîhanê dikare bi pendekî yan gotineka tenê jî tev li malperê bibe. Herweha dê malper qadeka gengeşeyê be, ew jî li ser mijarên zimanî ku dê nêrîna sazîyên peywendîdar û her kesê ku bi xebatên zimanî ve mijûl e, bihê girtin û bi kombûyîne dê encama gengeşeyê were pejirandin. Çimkî sazî wê yekê hêvî dike ku ne tenê di sînorê rojavayê Kurdistanê da bimîne, lê belê xwe bigihîne asta tevahîya Kurdistanê, da ku kokeka zimanî saz bike ku her kurdîaxêvek li ser wê kokê, şopa xwe bidomîne. Lewra ji bo vê malperê hemû pêdivîyên teknîkî ji cih, laptop, kamîra û hwd. hatine peydakirin. Li kêleka vê malperê jî dê kovarek ji hêla sazîyê ve bihê weşandin.


Ferheng û lêkolînên zimanî

SZKyê ji bo kar û xebata xwe cihekî nû li gorî çawaniya kar amade kiriye. Ji bo lêkolîn û amadekirina ferhengê, pirtûkxaneyek ava kiriye û ji pirtûkên cihêreng tijî kiriye. Weke armanceka demdirêj, dest bi amadekirina ferhengêka giştî dike ku li gorî birêveberên sazîyê dê li ser asta giştî herêmên Kurdistanê be, herweha dê bi wêneyan bihê dewlemendkirin. Ji lew ra demeka dirêj ji karê vê ferhengê ra hatiye veqetandin û li gorî pêdivîya kar û xebata ferhengê û lêkolînan komîte dihên sazîkirin. Di milê etîmolojîyê da jî sazîyê amadekariya xebatekê dike ku dihê pêşbînîkirin komîteyeka taybet bi ferhenga etîmolojîyê di hindirê sazîyê da vebe.

Li gel van armanc û daxwazên navbirî, Sazîya Zimanê Kurdî di kar û xebata xwe da berdewam e. Di destpêkê da jî sazîyê derfeta kar ji her zimanhezêkî ra raber kiriye, herweha amadebûna xwe ji alîkariya di her milî da ji cih û her pêdiviyên kar ra, ragihandiye. Ku wekî sazî derîyê wê ji her kurdekî ku bixwaze dilopekê li çemê zimanê kurdî zêde bike, vekirî ye. Li gel wê jî berhemên wê dê ji evîndarên zimanî ra raxistî bin. ■



TU BADE



ALAN HAMO

Ziman şêrîn lêv da bade
 Bêçar im bes sitû li min bade
 Lêvxwinav hew li bax fade
 Sorhinark û dêm xweş kade
 Mermer, karban tune ji wade
 Memik hîn li bîr kuştîm ji wade
 Gerden boxaz hew ji min re zade
 Deşt û girên wê bi min qade
 Dûrî li min pir zor û tade
 Evîndar im dînbûn li min çî rade
 Bedbext im ta li ba min xwe rade
 Şopa Eyûb bi min ket Made
 Dil ji min û li te ku agir dade
 Xeckir li min temen lê hîn dil şade

فيروز

ماجدة داري



منذُ فيروزَ في فراشاتٍ وأزهارٍ
كلُّ أرضٍ دونها خاويةٌ
وكلُّ ربيعٍ مواتٌ

أسكبُ قهوتي
أملأُ الفجرَ بنكهةِ البحرِ
وأصغي إلى يديها وهي ترسمُ
غلافَ قلبي
وتكتبُ فاتحةَ الكلامِ ■

أنا ملي سيّدة الارتباكِ
أقرعُ بها بابَ الخريفِ
كاهنةٌ ملتحفةٌ بالمرايا
أقفُ أمامَ المرأةِ
شحوبٌ .. صمتٌ
أهذهِ صورتي أم تمثالٌ ميديّ
ضربتهُ السنواتُ
كلما ازدادتُ التصاقاً برأسي
هربتُ أوقاتَ الأعشابِ
وتربّعَ خيالٍ وجهه
يا مَنْ كنْتُ سائحاً في عينيّ الحزینتينِ
الليّلةُ خلّتكِ معي
كانتُ كهذهِ الليّلةِ

فيروزُ
عزفُ دمنّا
وجهمها وأسماؤها
وها نحنُ نتقاسمُ
الصقيعَ والخبَرَ والسجائرَ
غارقينَ في قصائدِ نالي

إيه .. يا صوتها الحلوّ
كم أحبُّكِ
كم أرحلُ إليك معَ هذا الصّوتِ
كم أتيكُ معَ هذهِ القصيدةِ

سأبكي قليلاً على
كما تبكي قبرةً تائهةً
وأضيقُ
كما ضاعَ شادي في الرّحامِ

أينَ أنا؟
ثمّةُ وادٍ بيني وبينِي
فيروزُ
شامةٌ في قلبي
ونائي يملؤني بالرحيلِ إلَيَّ ..



أهم محاور رايات السلام..

راديو ولات يلقي الضوء على واقع أطفال و نساء داعش في مخيم الهول



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٦٦) ٢٠١٩/٩/١ م